Mihemed Şiya Sûdanî li 1ê Îlona 2023ê biryar da ku baregehê berê yê

û çûnê di navbera Kerkûk û Hewlêrê de. Taybet li taxên Kurdan bêzarî û bargiraniyeke zêde ji bo xwecihan çêbû, vê jî wesa kir ku welatîyên wan taxan wan bêzêrî û destdirêjiyan qebûl nekin û daxwaza bidawîanîna wê rewşê kir.

Roja 3ê Îlona 2023ê, Dadgeha Bilind a Federalî ya Îraqê biryara rawestandina radestkirina baregehê Operasyonên Hevpar li Kerkûkê ji bo PDKyê derxistibû.

Heta li dawiyê, li roja 12ê Îlona 2023ê, Dadgeha Bilind a Federalî ya Îraqê biryara rawestandina radestkirina baregehê Operasyonên Hevpar helweşand û biryar da wî baregehî ji bo PDKyê vegerîne. Di civîna 26ê Cotmeha 2023ê de, ji bo parastina canê tebayî û seqamgîriya bajarê Kerkûkê, Komîteya Navendî ya PDKyê biryar da baregehê berê yê civata serkirdetiya xwe li Kerkûkê pêşkêşî Zanîngeha Kerkûkê bike û ji bo xwendekaran û piroseya xwandinê û rewşenbîrî û pêşxistina wî bajarî bike diyarî. PDKyê bi vê pêngava xwe tekez kir ku Kerkûk her dilê Kurdistanê ye û piştî 16ê Cotmehê jî her xebatê ji bo çareserkirina birîna dilê Kerkûkiyan dike.



bike, ev jî piştî ku bi rengekî qanûnî mafê wergirtina wî baregehî wergirt.

Piştî rûdanên 16ê Cotmeha 2017ê, baregehê Civata serkirdetiya PDKyê li Kerkûkê ji aliyê fermadeya operasyonên hevpar ên Kerkûkê ve hatibû dagirkirin. Tevî ku yek ji xalên karnameya kabîneya Sûdanî ew bû ku baregehên PDKyê lê hatiban vegerandin û ew xal li Perlemana Îraqê jî hatibû pejirandin, lê ew mijar heta Tebaxa îsal wekî xwe mabû.

Piştî ku Serokwezîrê Îraqê

Civata Serkirdetiya PDKyê li Kerkûkê ji aliyê fermadeya operasyonên hevpar ên Kerkûkê ve bê berdand û li PDKyê bê vegerandin, li 28ê Tebaxa 2023ê, komeke Ereben binecihkirî û şovînî yê Kerkûkê li beranberî baregehê Civata Serkirdetiya PDKyê ji bo heyama şeş rojan çadirên xwe vedan û rêya sereke ya Hewlêr-Kerkûkê daxist.

Daxistina rêya sereke bandoreke temam li ser jîn û jiyara welatîyan kir û bû sedema çêbûna astengên hatin

Pentagon: Li Îraq û Sûriyeyê di 10 rojan de 20 caran êrişî hêzên Amerîkayê hatiye kirin

Pentagonê ragihand ku li Îraq û Sûriyeyê di 10 rojan de 20 caran êrişî hêzên Amerîkayê û Hêzên Hevpeymaniya Navneteweyî hatiye kirin.

Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) li ser êrişan daxuyaniyek belav da. Pentagonê got, "Ji 17 heta 27ê Çirya Pêşîn, li Îraqê herî kêm 14 caran êrişî hêzên Amerîkayê û Hêzên Hevpeyman hatine kirin.

Li Sûriyê jî şeş caran bi dron û roketan êrişî wan hatine kirin, wate bi giştî 20 êriş hatine kirin û piraniya êrişan jî bi rêya sîstema parastinê hatine pûçkirin." Pentagonê diyar kir ku di du êrişan de ku bi dronan êrişî Binkeya Eyn Esedê yali parêzgeha Enbarê a Îraqê û Binkeya Tenefê ya li Sûriyê hatine kirin 21 personelên Amerîkî birîndar bûne.

Li gorî wê daxuyaniyê, hêzên Amerîkayê êrişî du depoyên çek û teqemenîyan ên hêzên Supaya Pasdaran û hêzên nêzîkî wan kirine û wiha got:

"Balafirên şer ên F-16 û F-15 yê Amerîkayê roja 26ê Çirya Pêşîn çend êriş birine ser depoyên çek teqemenîyan li navçeya Ebû Kemalê ya li Sûriyê ku ji aliyê Supaya Pasdaran û grûpên nêzîkê Supaya Pasdaran ve dihatin bikaranîn û her du depo (cebilxane) hatine jînavbirin."

Li gorî Pentagonê, ti peywendîya êrişên ser hêzên nêzîkê Îranê, bi şer û aloziyên navbera Îsraîl û grûpên çekdar ên



Kezneyê ve nîne û pê de çû: Ev êriş bi mebesta parastina personelên Amerîkî yê li Îraq û Sûriyê ne û ji nakokiyên navbera Îsraîl û Hemasê cuda ne. Siyaseta Amerîkayê li hemberî nakokiyên di navbera Îsraîl û Hemasê de naguherînin." Dawiya sala 2021an Iraqê ragihand ku erkê hêzên şerker ên biyanî li welêt bi dawî bûye û erkê Hevpeymaniya Navdewletî bo şewir û perwerdekirina hêzên navxwe hat guhertin. Di wê çarçoveyê de, du hezar û 500 serbazên Amerîkî û hezar serbazên din ên Hevpeymaniya Navdewletî li sê binkeyên serbazî û esmanî yê Îraq û Herêma Kurdistanê mane.

Serok Barzanî û Balyozê Fransa li Iraqê rewşa siyasî û rûdanên li navçeyê gotûbêj dikin



Serok Mesûd Barzanî îro 28ê Cotmeha 2023an, pêşwazî li Balyozê Fransa li Iraqê Eric Chovalier kir.

Serok Mesûd Barzanî îro 28ê Cotmeha 2023an, pêşwazî li Balyozê Fransa li Iraqê Eric Chovalier kir.

Di hevdîtîne de, Balyozê Fransa li Iraqê silavên Serokê Fransayê Emmanuel Macron gihandin Serok Barzanî. Herwiha guftûgo li ser rewşa siyasî û rûdanên li navçeyê û eger û metirsiyên qonaxa bê hatin kirin.

Pêwendiyên di navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Iraqa Federal de, mijareke din a hevdîtîne bû û hewlên ji bo çareserkirina pirs-girêkan hatin nixandîn.

Balyozê Fransa li Iraqê destxweşî li biryara Serok Barzanî ya dayîna baregeha Encûmena Serkirdatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) bo zanîngeha Kerkûkê bi mebesta aramkirina rewşê kir û ew bi biryareke hişmend binav kir.

Mesrûr Barzanî dibistan û baxçeyê zarokan ên Macîdî vedike

Îro roja Çarşemê, 25ê Cotmeha 2023ê, seet 9:30 ê sibehê, Serokê Hikûmeta Herêma Kur-



distanê Mesrûr Barzanî dê dibistan û baxçeyê zarokan ên Macîdî li Hîwa Sîtiya bajarê Hewlêr veke.

Îro roja Çarşemê, 25ê Cotmeha 2023ê, seet 9:30 ê sibehê, Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî dê dibistan û baxçeyê zarokan ên Macîdî li Hîwa Sîtiya bajarê Hewlêr veke.

Dibistana bineretî ya Macîdî û baxçeyê zarokan ê Macîdî li ser rûberê 15000 metrên ducarkî û bi gojimê nêzî pênc milyar dînanan hatine çêkirin û dê pêşkêşî Hikûmeta Herêma Kurdistanê bên kirin. Xwandin dê li dibistan û baxçeyê zarokan ên Macîdî bi zimanê Ingilîzî û bi rengê serdemane be.

HEDEP'ê ji bo 'Avakirina Komara Demokratîk' bang kir

Hevserokên HEDEP'ê Tulay Hatîmogûllari û Tûncer Bakirhan bang kirin ku bi hev re komara demokratîk ava bikin. Hevserokên Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (HEDEP) Tulay Hatîmogûllari û Tûncer Bakirhan bi wesîleya salvegera 100'emîn a komara Tirkîyeyê de daxuyaniyek weşandin.

Hevserokan gotin, "Beriya ku sed salên din ji dest biçin, ji bo jiyanêke bi hev re û wekhev a gelan, baweriyar, bindestan û demokratîk em bi hev re Komara Demokratîk ava bikin."



Hevserokan gotin, "Demokratîkkirina komarê wezîfeya me ya dîrokî ye. Komarê sedsalek li pey xwe hişt" û wiha dewam kirin: "Bi destpêkirina sed-sala duyemîn de jinûve avakirina Komara Demokratîk wezîfeyeke dîrokî ye ku li pêşîya me ye. Kêmasiya bingeîn û herî girîng a sed-sala destpêkê ew bû ku ji demokrasiyê bêpar bû. Çand, bawerî û nasnameyên cuda li ser bingeha welatiya wekhev bi rengê azad û hurmetdar nekarîn bijîn, zîhniyeta tekperest serwer bû. Ji ber vê yekê pirs-girêka Kurd bi rengê demokratîk û aştiyane nehate çareserkirin. Bi destpêkirina sed-sala duyemîn de avakirina Komara Demokratîk miftiya avakirina neteweya demokratîk û welatîbûna azad e. Di serî de pirs-girêka Kurd pirs-girêkên gel û baweriyar bi Komara Demokratîk çareser dibin. Komareke li Tirkîyeyê bi demokrasiyê hatiye tacî-darkirin, derfeta jiyana aştiyane dide Kurdan, Tirkan, Ereban, Ermen, Yahûdî, Fars, Suryanî û hemû gelên din ên Rojhilata Navîn, bi vî rengî wê ji çareserkirina pirs-girêkên dîrokî yê li herêmê re bibe alîkar. Werin em dersan ji sed-sala destpêkê derxînin. Beriya ku sed salên din ji dest biçin, ji bo jiyanêke bi hev re û wekhev a gelan, baweriyar, bindestan û demokratîk em bi hev re Komara Demokratîk ava bikin."

Sirrî Sakik: Em dikarin rûpeleke spî ya nû vekin

Parlamentê HEDEP'ê yê Agiriyê Sirrî Sakik, bal kişand li ser komkujiyên li Tirkîyeyê û got, "Ev sedsala reş a Komarê ye. Em dikarin bi hev re komareke nû ava bikin. Em dikarin rûpeleke spî ya nû vekin."

Li lijnaya Giştî ya Parlamentoya Tirkîyeyê nîqaşên li ser pêşniyaz-name û pêşniyarên ji bo destûrê berdewam in.

Parlamentê Partiya Wekhevî û Demokrasiyê (HEDEP) yê Agiriyê Sirrî Sakik li Lijneya Giştî ya Parlamentoya Tirkîyeyê axivî.

Sirrî Sakik komkujiyên ku di dîroka Komara Tirkîyeyê de çêbûne li ser rûpelekê çapkir û di meclîsê de nîşan da. Sirrî Sakik dema derket ser kursî, bi Tirkî û Kurdî got "êvar baş".

Sakik diyar kir ku ev îfadeya ku wî bi Kurdî bikar aniye dê wekî "zimanê nenas" di protokola meclîsê de cih bigire û bertek nîşan da:

"Dîroka Komarê ewqasî zelal û kurt e. Redkirin tê wateya înkâr û îmhayê." Sakik diyar kir ku ji bo vekirina deriyên "komara demokratîk" divê pêşî rastî werin dîtin û got:

"Birêz Erdogan di civîna komê de çi dibêje, divê rêvebirên MHP û CHPyê biçin li rûniştin û protokolên veşartî yê meclîsê binêrin, ew dê li wir Kurdan, Kurdistanê, Çerkezên û Lazistanê bibînin."

Ma Mustafa Kemal parçeker e? Dema Mustafa Kemal bang li parlementerên Kurd dikir, digot, 'Parlementerên Kurdistanê'. Belê rast



digot.

Piştî wê çi çêbû? Destûra bingeîn a 1921an ku dibêje ev axa Kurd û Tirkan e, her tiştî zelal dike. Piştî wê jî Lozan.

Şandeyek tê vir. Mustafa Kemal bi parlementerên Kurd re hevdîtînekê dike. Girtiyê Dêrsimê Hasan Hayrî, Yusuf Ziya û hemû weklên Kurd vedixwîne hevdîtîne. Bi kincên xwe yê netewî ve tê meclîsê. Jê re li çepikan dixin û dirabin ser xwe. Ev çarenûsa hevpar a Kurd û Tirkan e, ev der welatê wan e."

"Em dikarin rûpeleke spî ya nû vekin"

Sakik di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Bi hezaran Kurd û Elêwî tîn qetlikirin. Serhildanên Nasturiyan hene. Li Elkê jî bi heman awayî serhildan hene... Yusuf Ziya û Hasan Hayrî, li Xarpêtê ji ber axaftin

û cil û bergên neteweyî yê Kurdî hatin darvekirin. Yek jî li Bedlîsê.

Wan berdêla piştgiriya xwe bi canê xwe da. Piştî serhildana Şêx Saîd û hevalên wî çêdibe. Dibêjin hûn dê mafê me bidin me. Ew jî li Amedê hatin darvekirin û gora wan jî nediya e. Piştî wê bi hezaran bûyer diqewîm in."

Sirrî Sakik bal kişand ser komkujîya Roboskî û gotinên Erdogan ên "Ev komkujî dê li korîdorên Enqereyê wînda nebe" bi bîr xist û got, "Lê wînda bû."

Sakik têkildarê qetliaman got:

"Ev sedsala reş a Komarê ye lê em dikarin komareke nû bi hev re ava bikin. Em dikarin komareke demokratîk bi hev re ava bikin. Peymana herî girîng, peymana ku dewletê bi gelê xwe re çêkiriye. Em êdî dikarin rûpeleke spî ya nû vekin."

Trump: Ez ê piştgirên Filistînê dersînor bikim



Serokê berê yê Amerîkayê Donald Trump, ku di ji bo hilbijartinên bê yê Serokatiya Amerîkayê, bi namzedê Komariyan re rikeberiyê dike, di konferansa Koalîsyona Cihûyên Komarî ya li Las Vegasê de axivî. Donald Trump di axaftina xwe de bal kişand ser şerê Îsralê yê li dijî Filistînê û got ku hemû biyanîyên ku beşdarî xwepêşandanên alîgirên Filistînê yê li Amerîkayê dibin, dê bîr dersînorkirin. Trump got, "Em ê terorîstên Îslamî yê radikal li derveyî welêt bihêlin. Qedexeya derketina derve tê bîra we? Rojê ez ê vê qedexeya derketina derve ji nû ve saz bikim."

Trump bangên agirbestê jî rexne kir, got ku "Berpîrsiyariya her jiyana ku di vê pevçûnê de hatiye wendakirin, tenê li ser milên Hamasê ye.

Em dest bi şer nakin, lê divê beriya aştiyê şer bi dawî bibe. Ez ê Şerê Sêyemîn ê Cîhanê yê rawestînim. Em ê bi hêza xwe, aştiyê pêk bînin."

Serok Barzanî serexweşiyê li malbata Şehîd Eqîd Salih Zîrarî dike

Serok Barzanî serexweşiyê li malbata şehîdê şerê çiyayê Qereçûx Eqîd Salih Zîrarî dike.



Roja Pêncşemê, 26ê Cotmeha 2023ê, Baregehê Barzanî ragehand ku Serok Barzanî bi rêya telefonê peywendî bi malbata Şehîd Eqîd Salih Zîrarî kiriye, serexweşî lê kiriye û hevxiyê xwe jê re diyar kiriye.

Baregehê Barzanî parve kiriye, "Piştî sê rojan ji birîndarbûna Şehîd Eqîd Salih Zîrarî di şerê çiyayê Qereçûx de û mana wî li nexweşxaneyê, sibeha îro roja Pêncşemê ji ber giraniya birîna xwe şehîd bû. Roja Pêncşemê, 26ê Cotmeha 2023ê, Serok Mesûd Barzanî bi rêya telefonê peywendî bi malbata Şehîd Eqîd Salih Zîrarî kir, serexweşî lê kir û hevxiyê xwe ji bo wan diyar kir.

Li Mexmûrê 3 Pêşmerge şehîd ketibûn: 'Di bûyerê de destên derveyî hene'

Sererkanê Pêşmergeyan da zanîn ku di bûyerê li Mexmûrê de destên derveyî hene. PKKyê li navçeya Mexmûrê 4 xalên kontrolê yên li Çiyayê Qereçûxê radestî artêşa Îraqê kirin. 22yê ve mehê saet 16:00an li Mexmûrê di navbera Pêşmerge û artêşa Îraqê de şer derket.



Di encama vî şerî de 2 Pêşmerge şehîd ketibûn. Fermandarên Lîwaya 18an a Pêşmergeyan Salih Zîrarî jî di vî şerî de birîndar bûbû. Salih Zîrarî vê sibehê li nexweşxaneyê ku dihat dermankirin şehîd ket.

Sererkanê Pêşmergeyan Îsa Uzêr, beşdarî merasîma bixakspartina Salih Zîrarî bû.

Îsa Uzêr li vê darê da zanîn ku "Em li hêviyê ne ku di dema herî nêzîk de rewşa Çiyayê Qereçûxê asayî bibe."

"17 Pêşmerge birîndar bûn"

Sererkanê Pêşmergeyan destnîşan kir, "Di wî şerî de 17 Pêşmerge birîndar bûn, niha jî 2 ji wan li nexweşxaneyê ne." Îsa Uzêr herwiha amaje pê kir ku di wî şerî de 2 leşkerên artêşa Îraqê mirine û 8 jî birîndar bûne.

Sererkanê Pêşmergeyan Îsa Uzêr "nebûna hevahengiya di navbera Pêşmerge û artêşa Îraqê de" wekî sedema herî mezin a vê bûyerê nîşan da. Îsa Uzêr di berdwamiya axaftina xwe de bal kişand ser "destên derveyî" û got:

"Di girtina bilez a van xalan de destên derveyî hene. Niha em hewl didin van pirsgrêkan çareser bikin."

Konsulê Tirkîyeyê yê Hewlêrê: Hevxiyê Nêçîrvan Barzanî rengvedana dostatiya kûr e

Konsulê Tirkîyeyê yê Herêma Kurdistanê, li beramberî wê hevxiyê Serokê Herêma Kurdistanê ya ji bo mexdûrên erdhejên 6ê Sibata îsal ên li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê, spasiya wî kir.

Konsulê Giştî yê Tirkîyeyê yê Herêma Kurdistanê Mehmet Mevlut Yakut îro li merasîma li Hewlêrê ya bi helkefta 100mîn salvegera damezrandina Komara Tirkîyeyê hatibû organîzekirin axivî.

Mehmet Mevlut Yakut di beşeke axaftinê xwe de behsa pêwendiyên navbera Hewlêr û Enqereyê kir.

Yakut behsa tevger û helwesta Hikûmeta Herêma Kurdistanê yê piştî erdheja 6ê Sibata îsal a li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê kir û got: "Fersend e ji bo ku em ji dil spasiya xwe nîşan bidin ji bo hevxiyê kûr a Hikûmeta Herêma Kurdistanê, ew jî piştî erdheja wêranker a sibata îsal a li Tirkîyeyê. Hikûmeta Herêma Kurdistanê tavilê alîkarî pêşkêş kir û tîmên hawarhatinê û hevkarî şandin navçeyên zererdîti."

Konsulê Giştî yê Tirkîyeyê yê li Herêma Kurdistanê her wiha got: "Serok Nêçîrvan Barzanî yek ji wan serkirdeyan bû ku serdana navçeyên erdhejê kir û hevxiyê xwe ligel qurbanîyan nîşan da. Ew hevxiyê rengvedana dostatiya rast û kûr a di navbera me de ye. Lewra pêzanînên me hene ji bo wî û her dem jî dê di bîra me de bimîne."

Roja 6ê Sibata 2023yan erdhejê mezin û wêranker parêzgeha Mereşê li Bakurê Kurdistanê hejand ku bandor li 10 parêzgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê kir.

Roja 14-02-2023, Serokê Herêma



Kurdistanê, Nêçîrvan Barzanî serdana beşek ji navçeyên erdhejê li Bakurê Kurdistanê kir û di axaftinê de li parêzgeha Dîlokê gotibû: "Ji ber vê karesatê di hemû malên Herêma Kurdistanê de şîn heye. Li gelek deveran şahî û pîrozbahî hatine rawestandin ji bo nîşandana hevxiyê bo wan û gelê Tirkîyeyê."

Nêçîrvan Barzanî herwiha gotibû, "Li gorî îmkânên Herêma Kurdistanê, ya ji destê me bê, em dê bikin. Bi wê îmkana kêma ku me heye, em dixwazin wefadariya xwe bo gelê Tirkîyeyê tekez bikin."

Her wê demê serdana Nêçîrvan Barzanî di medyaya Tirkîyeyê de deng veda.

Konsulê Giştî yê Tirkîyeyê di beşeke din a axaftina xwe behsa peywendiyên navbera Enqereyê ligel Bexda û Hewlêrê kir û got: "Giringiyeke taybet a peywendiyên me yê bi Îraqê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê re heye. Serdana wezîrê me yê derve Hakan Fîdan a di meha

Tebaxê de ji bo Bexda û Hewlêrê tekezî li ser pabendbûna me ji bo aramiya Îraq û Hikûmeta Herêma Kurdistanê dike, herwiha tekezî li ser giringiya rûbirûbûna astengên hevbeş jî kir."

"Pêwendiyêke çandî ya kûr heye"

Mehmet Mevlut Yakut ragihand, di vê helkeftê de tekeziyê li ser pabendbûna xwe bi pêşxistina hevahengiyên di navbera Enqere û Hewlêrê de dikin û wiha pê de çû:

"Di navbera her du alîyan de sînor, dîrokekî dûr û dirêj û pêwendiyêke çandî ya kûr heye. Peywendiyên me di warên cuda de pêş dikevin, weke bazirganî, hilberîn, xwendin, tendirustî û geştyarî."

Bi gotina Konsulê Giştî yê Tirkîyeyê pêşxistina peywendiyên navbera welatê wî û Hewlêrê pêwîst e û got:

"Çarenivîs me bi hev re girê dide. Bi rêya têgihîştina hevbeş û hevkarîyê jî em dikarin paşerojeke baştir ji bo hemû alîyan biafirînin."

150 deverên Rojavayê Kurdsitanê hatin bombebarankirin: 2 milyon welatî mexdûr bûne

Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) ragihand ku Tirkîyeyê 150 deverên li "bakur û rojhelatê Sûriyeyê" bombebaran kirine.

Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan rapora xwe ya têkildarî encamên êrişên Tirkîyeyê yê li Rojavayê Kurdsitanê belav kir.

Li gorî rapora Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan, Tirkîyeyê ji 5ê Çiriya Pêşîn ve, 150 deverên Rojavayê Kurdistanê bombebaran kirine û nexasim jî jêrxaneyên li deverê dike armanc.

Herwiha hat ragihand ku ji ber êrişan 18 wêstgehên avê ji kar ketine û careke din ava wêstgeha Elokê li ser Heseke hatiye qutkirin.

HRW got, tevî rewşa aborî ya xirab, welatî neçar dibin avê bikirin.

"Saleke av nayê taxa me"

Welatiyeke wiha mexdûriyeta xwe anî ziman, "Ev salek e av nagihêje taxa me. Em avê dikirîn lê av ne paqij e. Carekê me av kirî, aveke zer bû."

Welatiyeke din jî got, "Kar nîne, mûsim nîne. Xelk hejar e û tevî wê jî neçar e avê bikire. Em neçar in li nava kolanan xwe bişon. Ji ber ku



ava em dikirin, em ji bo şûştinê bi kar nayînin."

Di beşeke din a raporta HRWyê de behsa encamên xirab ên qutkirina avê yê li ser Heseke tê kirin.

Li gorî raporê welatî ava gemar vedixwin û ew jî dibe sedem ku nexweşiya hinavêşê belav bibe.

Têkildarê nexweşiyên belav bûne welatiyekî got:

"Kurê min bi nexweşiya hişkbûnê ketiye, ji ber ku navçûn bi wî re çêbûye. Ava em vedixwin ne paqij e û

ev jî dibe sedema nexweşiyên."

Bijîşk Ebdulrehman Silêman got:

"Bê av karê nexweşxaneyê bi rê ve naçe. Carinan em tîn neştergeriyê bikin, av nîne em destê xwe bişon. Ev bandorê li karê me dike."

Tirkîyeyê 5ê mehê, bi dron û balafirên êrişî Rojavayê Kurdistanê kir.

Ji ber têkdana wêstgehên av û elektrîkê, 2 milyon welatî mexdûr bûn. Di heman demê de, ziyânên mezin gihişt nexweşxaneyan û tendirsutiya welatiyan.

Serok Barzanî: Salih Qellab parêzvanekî dilsoz ê gelê Kurdistanê bû



Serok Mesûd Barzanî ji ber koça dawiyê ya nivîskarê Urdinî û parêzvanê dilsoz ê gelê Kurdistanê Salih Qellab,

sersaxî li Şahê Urdinê, Şah Ebdullahê Duyem û malbata Salih Qellab kir.

Serok Mesûd Barzanî ji ber koça

dawiyê ya nivîskarê Urdinî û parêzvanê dilsoz ê gelê Kurdistanê Salih Qellab, sersaxî li Şahê Urdinê, Şah Ebdullahê Duyem û malbata Salih Qellab kir.

Serok Mesûd Barzanî sersaxiyê belav kir û tê de ragihand, "Bi xemeke mezin min nûçeya koça dawî ya nivîskar û rewşenbîrê navdar ê Urdinî Salih Qellab wergirt, ku dostekî min ê nêzîk û parêzvanekî dilsoz ê gelê Kurdistanê bû." Serok Barzanî fi peyama xwe de got jî: "Ez sersaxiyê li birayê xwe birêz Şahê Urdinê, Şah Ebdullahê Duyem û malbata xwedêjêrazî Salih Qellab re dikim."

Nivîskar û rojnamevanê navdar ê Erebb û wezîrê berê yê ragihand û rewşenbîrî yê Urdinê Salih Qellab îro 25ê Cotmeha 2023an di temenê 79 saliyê de koça dawiyê kiribû.

Pêşmergeyê ku li Mexmûrê birîndar bûbû şehîd ket

Alîkarê fermadanrê Lîwaya 18an a Pêşmergeyan Puşo Xalid ku li Mexmûrê



di şerê navbera Pêşmerge û artêşa Îraqê de birîndar bûbû şehîd ket.

22yê ve mehê saet 16:00an li Mexmûrê di navbera Pêşmerge û artêşa Îraqê de şer derket.

Di encama vî şerî de 2 Pêşmerge şehîd ketibûn.

Fermadarê Lîwaya 18an a Pêşmergeyan Salih Zîrarî jî ku di vî şerî de birîndar bûbû doh şehîd ketibû.

Alîkarê Fermadarê Lîwaya 18an a Pêşmergeyan Puşo Xalid jî di vî şerî de birîndar bûbû.

Li gorî daxuyaniya Wezareta Pêşmergeyan Puşo Xalid vî sibehê li nexweşxaneyê ku dihat dermankirin şehîd ket.

Bi şehîdbûna Puşo Xalid di encama şerê li Mexmûrê de hejmara şehîdên Pêşmerge derket 4an.

Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê: Me li Sûriyeyê bersiv da êrişan

Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê Lloyd Austin got, "Me li rojhilatê Sûriyeyê du cebilxaneyên çek û teqemeniyan kirin armanc." Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê Lloyd Austin got, "Me li rojhilatê Sûriyeyê du cebilxaneyên çek û teqemeniyan kirin armanc."



Lloyd Austin destnîşan kir ku ew cebilxane ji aliyê grûpên çekdar ên nêzîkî Îranê ve bi kar hatine. Piştî destpêka şerê Hamas û Îsraîlê baregehên Amerîkayê yê li Îraq û Sûriyeyê tîn armancgirtin. Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê ragihand ku wan bersiv daye êrişan û hêzên wan li rojhilatê Sûriyeyê du baregehên grûpên çekdar ên nêzîkî Îranê bombebaran kirine.

Lloyd Austin da zanîn ku balafirên şer ên Amerîkayê du cebilxaneyên çek û teqemeniyan kirine armanc.

Wezîrê Parastinê yê Amerîkayê Lloyd Austin amaje pê kir ku wan ev êriş, wekî bersiva "êrişên sernekftî" yê grûpên milîs ên nêzîkî Îranê pêk aniyê.

Herwiha di vî êrişê de du balafirên F-16 baregehên grûpên nêzîkî Îranê kirine armanc.

21 leşker jî birîndar bûne

Lloyd Austin diyar kir ku bi sedema êrişên wan grûpan, heta niha belênderekî (mutedhî/taşeron) Amerîkayî miriye û 21 leşker jî birîndar bûne.

Li aliyê din, berpîrsên Pentagonê (Wezareta Parastinê ya Amerîkayê) da zanîn ku ev êrişê wan, îro saet 04:30î hatiye encamdan.

AMED – Kirêgirtina xaniyan bûye derdekî bêderman

Li Amedê buhayê kirêkirina xaniyan bûye derdekî bêderman. Hin welatî hene 4-5 meh in li xaniyekî kirê digerin lê hêj bi dest nexistine.

Xaniyên kirê ketine bazara reş. Di ser de jî buhayê zêde ya kirêyan...

Xelk li hemberî vî rewşê gelek gazinan dike. Ew dixwazin dewlet bi destê xwe xaniyan çêke û bi erzanî bide xelkê. Erdogan Kardaş ajokarê texsiyê ye. Ew 5 meh in ji rêwiyan zêdetir çavên xwe li xaniyên kirê digêrîne.

Lê heta niha jî xaniyê kirê bi destê wî neketiye. Li ser tu xaniyek nivîsa "kirê" li ber çavên wî nakeve.

Kirêcî Erdogan Kardaş ji Rûdawê re got: "Ez geriyam min 4-5 mehan xanî nedît. Mecbûr ez di wî xaniyê tê de me dimînim. Em nikarin xanî bibînin. Ê heye jî xwediyê xaniyan nadin. Dibêjin 20 hezar 30 hezar lire. Ka em ê ji ku bînin vî pereyî?"

Li Amedê kirêkirina xaniyan bûye derdekî bêderman. Yan xanî bi dest nakevin an jî dema xanî peyda bibe jî buhayê wê pir zêde ye.

Mûçeya herî kêr 11 hezar lîre ye lê kirê 15 hezar lîre ye

Welatî Hakan Adem got, "Niha xanî li Amedê nînin. Xwediyê xanî ji kirêciyan re dibêjin kirêya te 2 hezar lîre ye, ez dikim 15 hezar lîre. Qebûl dikî di xanî de bimîne ger qebûl nakî derkeve.



Mûçeya herî kêr 11 hezar lîre ye, kirê 15 hezar lîre. Ka dê kirêcî çawa vî pereyî bidin?"

Welatî Zahîde Doguş jî got, "Kirê livir pir buha ye. Herkes nikare bide. Xaniyên herî pîs 5-6 hezar lîre ne. Ew jî ji tiştêkî re nabe. Ên normal 10 hezar lîre ne."

"Milet birçî ye"

Welatî Mihemed Şah jî got, "Milet birçî ye. Nikarin nan bistînin. Kirê di nava salekî de 3-4 qat zêde bû. Tiştêkî gelek zor e." Burhan Dîllî jî bi salan e şewirmendiya kirîn, firotin û kirêkirina xaniyan dike lê tu carî evqas neketiye tengasiyê.

Ji ber ku xaniyên vala nînin, ew jî demeke dirêj e pere qezenç nake.

Şewirmendê Bazara Xaniyan Burhan Dîllî got: "Berê li Amedê 500 mutahîd hebûn lê niha tenê 50 mutahîd mane. Xanî têr nakin. Xanî pir kêr lîdikin. Milet niha çi bike? Wê rojê yek hatiye ji bo eşyayê xwe ji min embarek xwest, min kir û nekir peyda nekir. Xelk nikare cihekî ku eşyayê xwe bixê peyda bike." Li gorî amarên ku Saziya Statîstîka Tirkîyeyê belav kirine, di meha îlonê de li Amedê tenê hezar û 808 xanî hatine firotin. Ev jî nişan dide ku ne tenê kirêkirin, kirîn û firotin jî de rewşeke xirab de ye.

Li Hewlêrê hewla êrişê baregeha Amerîkayê

Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) ragihand ku êrişê li dijî baregeha asmanî ya Amerîkayê ya li Hewlêra hat "şikestî".

Rêxistina Berxwedana Îslamî ya Îraqê ragihand ku wan duh danê êvarî bi dronan êrişê baregeha asmanî ya Amerîkayê ya li Hewlêre kir.

Berdevkê Wezareta Parastinê ya Amerîkayê General Patrick Ryder di civîna çapemeniyê de derbarê êrişê daxuyanî da.

General Patrick Ryder êrişê piştrast kir û got: "Îro li dijî baregeha asmanî ya Hewlêrê ku hêzên me lê ne, hewldana êrişê hat kirin lê bi şikestî bi dawî bû.

Di êrişê de tu zererên canî çenebûn lê hinek zererên biçûk li binesaziyê bûn. Em dizanin ku ew grûpên milîs ên bi



piştewaniya Îranê ne û helbet em Îranê ji van koman berpîrsyar dibînin."

Wekî tê zanîn hêzên Amerîkayê li Firokexaneyê Navdewletî ya Hewlêrê û

li Herîrê hene.

Rêxistina Berxwedana Îslamî ya Îraqê diyar nekiriye ku ew êriş li ku derê hatiye kirin.

Meşa dîrokî ya Mela Mistefa Barzanî: Şopên wê li Şemzînanê hîn ji zindî ne

Di dîroka Kurdistanê de çûna Mela Mistefa Barzanî ya Yekîtiya Sovyetê yek ji bûyerên herî girîng e. Mela Mistefa Barzanî tevî 500 Pêşmergeyî



sala 1947an berê xwe dide Yekîtiya Sovyetê.

Meşa Mela Mistefa Barzanî û Pêşmergeyan ji Başurê Kurdistanê dest pê dike, Barzanî derbasî sînore Bakurê Kurdistanê navçeya Şemzînanê dibe.

Ev der e li navçeya Şemzînanê gundê Bêmboyê ye, yek ji wan gundan e ku Mela Mistefa Barzanî û Pêşmerge di dema meşa Sovyetê de berê xwe dayê û ew lê mane. Hîn ji gelek bîranînên wan li vî gundî mane.

Evdîmecdî Seîd Bêmbô, xelkê gundê Bêmboyê ye. Wî li ser rêwîtiya Mela Mistefa got: "Cenabê Barzanî 25ê meha 5an sala 1947an ji gundê Bêdawê derket, hat gundê Bayê. Dema hatiye Bayê babê min Seîd Bêmbô, li gundê Bayê çû pêşwaziya wî.

Du rojan li gundê Bayê bi Barzanî re ma, 27ê meha 5an piştî nivro leşker (Pêşmerge) bi serokatiya Barzanî bi rê ket, Gundê Bayê dikeve pişt van çiyayayan, ew jî pişt van çiyayan derketin û rêya wan ket vê heremê, hatine serê Deştîlokê.

Du Deştîlok hene, yek ji wan Deştîloka Şemo ye û li ser Geverê ye, ya din jî Deştîloka li ser Şemzînanê ye.

Hatine serê Deştîlokê û ji rêya Kevîkê derbas bûn gehîştine Gerke Cina ku ew der war û zozanên me ne. Bavê min dibêje bo serê êvarî em gehîştine Deştîloka Şemzînanê.

Mela Mistefa Barzanî û Pêşmerge li gundên Şemzînanê bi germî tîn pêşwazîkirin.

Mela Mistefa li van gundan bi xelkê re civînan encam dide û behsa bîr û hizra neteweyî dike, beşek xelkê wan gundan jî heta ser çemê Erezê bi Pêşmergeyan re dimeşin.

Nêvîyên wan kesan hîn jî bi perûşî behsa fedakarî û dilsoziya Mela Mistefa Barzanî û Pêşmergeyan dikin.

Evdîmecdî Seîd Bêmbô, wiha berdewam kir: "Heta digihin ser Rûbarê Erezê çend rojan di rê de dimînin. Bavê min jî heta ser Rûbarê Erezê bi cenabê Barzanî re diçe, bavê min behsa gelek serpêhatiyên xwe yên di rê de dikir.

Beşek ji wan me ji bîr kirine lê behsa tiştê dîke ku di bîra min de maye, bavê min digot me li cihekî bêhna xwe dide, Barzanî jî çenteyê xwe hindek keşk derxistin, yek ji taybetiyên Cenabê Barzanî jî ew bû ku ti demê çente û çeka xwe nedidan ti kesekî.

Îcar bavê min digot Cenabê Barzanî hindek keşk ji çenteyê xwe derxistin û xistin nava şûtika xwe û qutan û hûr kirin û li Pêşmergeyan da dabeş kirin û hindek toza keşkan ma, bixwe jî ew xwar."

Li navçeya Şemzînanê du gundên ku Mela Mistefa Barzanî û Pêşmergeyan dema meşa Sovyetê çûne wan hene.

Yek ji wan gundê Bêmboyê din jî gundê Bayê ye. Hatina Mela Mistefa Barzanî û Pêşmergeyan heta niha jî bandoreke cidî li ser bîr û hizra xelkê wan gundan û deverê hêlaye.

Wêjekar Qahir Bateyî jî bi vî awayî behsa bandora vê meşa Mela Mistefa kir: "Bêgoman hatina rehmetî Mela Mistefa Barzanî û dema çûna Rusyayê derbasbûna wî ji van gundan û şoreş û xebata wî bandoreke yekcar zêde li ser hişmendiya neteweyî ya civakê dirist kiriye.

Mela Mistefa Barzanî weke efsaneyekê dihat gotin di nava civakê de.

Serpêhatiyên Mela Mistefa Barzanî dema behs lê dihat kirin ji bo me zarokan weke çîrokan bûn em di nava wan de mezin bûn. Wî jî kariye bandora xwe li ser her Kurdekî vê heremê bike."

Gundê Bêmboyê hîn jî avadan e û nêzîkî 50 malî lê hene lê gundê Bayê jî ber şerên di navbera PKK û dewleta Tirkîyeyê de hatiye valakirin.

Mesrûr Barzanî: Yekane tiştê ku nayê telafîkirin xwendin e

Mesrûr Barzanî got, "Yekane tiştê ku nayê telafîkirin xwendin e. Ez hêvîdar im ku mamosteyên me yên birêz vegerin dibistanên xwe."

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, li Hewlêrê beşdarî merasîma vekirina dibistanek û baxçeyekî zarokan bû.

Mesrûr Barzanî di çarçoveya wê merasîmê de axivî û bal kişand ser "mafên mamosteyan."

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê da zanîn ku "ew piştigiriyê dide daxwazên mamosteyan" û got, "Divê hemû mafên mamosteyan bîr dayîn."

Ev demek e mûçeyên karmendên Herêma Kurdistanê ji Bexdayê dereng tîn şandin.

Mamosteyan li Silêmaniyê derengketina mûçeyên xwe ptoesto kiribû.

Mesrûr Barzanî di axaftina xwe bal kişand ser vê rewşê û anî zimên, "Divê rexne li wan aliyan bê kirin ku bûne sedema qutbûna mûçeyên mamosteyan"

Mesrûr Barzanî got, "Herêma Kurdistanê nebûye sedem ku mûçeyên mamosteyan neyên dayîn an jî paş bikevin."

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê bangî hemû aliyan kir ku bi hev re herin "wî cihê ku mafên mamosteyan û hemû xelkê Herêma Kurdistanê lê hatine bînpêkirin."

"Em dê mafên hemû gelê Kurdistanê biparêzin"

Serokwezîr Barzanî destnîşan kir

Mesrûr Barzanî li ser vê mijarê wiha axivî: "Ewên mamosteyan teşwîq dikin da ku neçin dibistanan



ku ew piştigiriyê dide daxwazên mamosteyan û berdewam kir:

"Ez radigihînim ku em piştigiriyê didin mamosteyan. Ez dengê xwe bi dengê wan re dikim yek. Divê mamoste tevên mafên xwe bi dest bixin.

Em dê bi berdewamî mafên mamosteyan, karmendan û hemû gelê Kurdistanê biparêzin." Li Herêma Kurdistanê sala xwendinê ya 2023-2024an 13ê Îlonê dest pê kir.

Lê ji ber boykota mamosteyan dibistanên Silêmaniyê, Helebce, Germiyan û Raperînê venebûn.

"Dixwazin tola xwe ji xwendekaran hilînin"

dixwazin tola xwe ji xwendekaran hilînin, ne ji yên ku mûçeyên wan birîne. Ev jî ne tiştê li rê ye.

"Yekane tiştê ku nayê telafîkirin xwendin e"

Yekane tiştê ku nayê telafîkirin xwendin e. Ez hêvîdar im ku mamosteyên me yên birêz vegerin dibistanên xwe û zarokên me perwerde bikin."

Li Herêma Kurdistanê nêzîkî milyonek û 800 hezar xwendekarî hene.

Ji ber boykota mamosteyan a li Silêmaniyê, Helebce, Germiyan û Raperînê nêzîkî 700 hezar xwendekarî heta niha jî neçûne dibistanên xwe.

Dr. Ferîd Sedûn: Amerîkayê hêzeke zêde şand Rojavayê Kurdistanê

Akademîsyen Dr. Ferîd Sedûn got, "Amerîkayê hêzên xwe yên li Rojavayê Kurdistanê zêdetir kirin. Di van demên dawî de gelek hêzên Amerîkayî hatin Rojavayê Kurdistanê."

Piştî şerê di navbera Îsraîl û Hemasê, li Rojhilata Navîn rageşî dîsa zêde bû.

Gelek caran êrişî baregehên Amerîkayê yên li Rojavayê Kurdistanê, Herêma Kurdistanê û Îraqê tê kirin.

Akademîsyen Dr. Ferîd Sedûn beşdarî beşdarî bultana Rûdawê bû û rewşa Rojhilata Navîn, şerê Îsraîl û Hemasê û êrişên li ser baregehên Amerîkayê nîrxand.

"Êrişên li ser baregehên ne nû ne"

Dr. Ferîd Sedûn wiha axivî: "Ya rastî ev êriş ne nû ne. Baregeh û xalên Amerîkayê ji destpêka damezrandina xwe ve li Rojavayê bûne armanc.

Ew ne tenê li Sûriyeyê dibin armanc, li seranserê Rojhilata Navîn dibin armanc. Ji Yemenê bigire heta Îraq û Libnanê. Ev bi rastî ji Amerîkayê re peyamek e. Eger hûn êrişî Xezeyê bikin, em dê jî êrişî we bikin."

"Her du alî peyaman didin hev"

Sedûn li ser pîrsa "Çima Amerîka li hemberî êrişên li dijî xwe bersivên qels dide", Sadûn wiha bersiv da:

"Îranê qet berpirsiyariya êrişan negirt ser xwe. Dibêjin, 'Yên ku êriş dikin milîs



in û kiryarên taybet in."

Dibêjin ti tîkiliya wan bi me re nîne û li derveyî Îranê ne. Herwiha Amerîka jî naxwaze bi Îranê re bikeve nava rageşiyê.

Her du aliyan peyamek ji hev re şandin. Peyama em îro ji şer re ne amade ne.

Her du alî ji hev re didin xuyakirin ku ev êrişên hanê wekî peyaman in, ne şerek e ku wê di navbera wan de dest pê bike."

"Amerîka çekên nû derbasî vê herêmê dike"

Li ser mijara ku amerîka hêzên dişîne Rojavayê Kurdistanê Dr. Sedûn

got: "Di vê qonaxa dawî de gelek hêzên Amerîkayê digihin devera me. Ne tenê ji bo Rojavayê Kurdistanê, ji bo herêma Tenefê jî hatin şandin.

Amerîka çî ji aliyê leşkerî ve çî ji aliyê çekan ve hêzên xwe li devera pirtir û xurttir dike. Çekên nû derbasî vê herêmê dike.

Ev jî weke amadekariyekê ye. dema ku şerê Xezeyê ji bon kontrola wan derkeve û bibe şerekî herêmî yan şerekî birfirehtir li vê herêmê, ew jî ne bê hêz bin û karibin berevaniyekê bikin.

Yan jî dema ku biryarekê bistînin têkevin vî şerî, ew jê re amade ne."

Tirkiye Efrînê topbaran dike

Artêşa Tirkîyeyê herêma navbera gundên Aqîbê û Ziyareyê yên Şêrawaya Efrînê jî herî kêr bi 30 topî topbaran kir.

Tora Çalakên Efrînê ragihand ku artêşa Tirkîyeyê herêma navbera gundên Aqîbê û Bêne yên nahiye Şêrawayê bi 7 topan, topbaran kir. Artêşa Tirkîyeyê herêma navbera gundên Aqîbê û Ziyareyê yên Şêrawaya Efrînê jî herî kêr bi 30 topî topbaran kir. Heta niha li ser encama ziyanên wan topbaranana ti agahî nehatine belavkirin.

Li aliyê din, Tirkîyeyê şeva borî Eyn Îsa topbaran kiribû û di topbaranê de kesek birîndar bûbû.

Herwiha ji ber vê topbaranê li gelek gundên Girê Spiyê kareba hatibû birîn.



AMED – 172 saziyan li ser ‘Pirsa Kurd’ deklarasyonek belav kir

Li Ameda Bakurê Kurdistanê 172 saziyên ku di nav wan de partiyên siyasî û saziyên civakî jî hene ji bo çareserîya “Pirsa Kurd” deklarasy-

Qaşo pêşengên siyaseta dinyayê, di şûna çareseriyê de, dibin sedema alozî û êşên ku pêk tên.

“Ez dixwazim pêşî li derzên



onek belav kir.

Saziyan ku di nava wan de DBP, HEDEP, DTK, TJA, MEBYA-DER, TUHAY-DER û OHD jî hene deklarasyoneke bi navê “Ji Niha ve Ber bi Dahatuyê ve Banga Azadiyê” belav kir.

Kurdiya deklarasyonê ji aliyê Hevserokê Giştî yê DBPyê Keskîn Bayindir ve hat xwendin.

Di deklarasyonê de ji bo çareserîya “Pirsa Kurd” bang hat kirin û herwiha deklarasyonê bal kişand ser rewşa Abdullah Ocalan.

“Serdest û rayedarên dewletê sûcdaran diparêzin”

Deklarasyona ku ji aliyê 172 saziyan ve hatiye parvekirin bi vî awayî ye: “Di bingeha pirsgrêkên civakî, şer û qirkirina xwezayê de, feraseta dewletê û polîtîkayên înkare ya gelan, bawerîyan, çandan û nasnameyan heye.

Dewlet hewl dide ku bi vî ferasetê şer û pevçûnan kûrtir bike û bi vî rêyê dixwaze ku hemû berhevkirinê civakî werin tasfiyekirin û têkbin.

Em dibînin, pêkanîna ku wekî sûcên giran tên pênasekirin û pêwîstiya ti caî li hemberî civakê pêk neyên, bi awayekî aşkere ji aliyê desthilatan ve pêk tên, serdest û rayedarên dewletê sûcdaran diparêzin, dixwazin sûcên ku li hemberî gel û civakê pêk tên meşrû nîşan bidin.

Ev sûcên ku di vî demê de li Rojava/ Bakur-Rojavayê Sûriyeyê/ Filistin, Qerebax, Ukrayna û li gelek cîhanên din pêk tên ber bi çav in.

Bi kurtasî em qala rewşeke ku navenda wê Rojhilata Navîn, yanî Mezopotamya û tevahiya cîhanê belav bûye dikin.

Gelê Kurd (ligel hemû destkeftiyên xwe) bi tehdîdên giran re rûbirû ye. Gelên Ermenî û Erebi, gelên Qefqas û Balkanan di nav şer û pevçûnan de ne. Her wiha sîstema kapîtalîst çav berdaye hemû erdnîgariyên ku gelên cûda lê dijîn.

Ev gel ji dewlemendiyên xwe yê sererd û binerd bêpar tên hiştin û ji axa xwe tên koçberkirin.

Heke em li gorî tecrûbeyên dîrokî bifikirin, sîstema Neteweyên Yekbûyî ya ku piştî şerê cîhanê yê duyemîn parastina nîrxên mirovahiye girtiye ser milê xwe berpirsiyariya xwe bi cih nayîne.

Li cîhanê serokdewletek yan jî siyasatmedarek nîne ku bi hêz û îradeya xwe van pirsgrêkên pergali çareser bike.

civakî û dîrokî bigirim”

Birêz Ocalan pêşeng û siyasatmedarê yekemîn e ku bi pêşdîtinên xwe dikare pirsgrêkên paşerojê yê li herêmê, li Rojhilata Navîn û li dinyayê biqewimin tesbît bike.

Di sala 2019an de, hîn şer, pevçûn û qirkirinan dest pê nekiribû, bi pêşdîtinên xwe diyar kiribû ku pirsgrêkên ku di vî demê de li herêmê û li cîhanê pêk tên, ji aliyê civakî ve wê girantir bibin û bibin sedema qirkirinan.

Wî anibû ziman ku ‘Ez dixwazim pêşî li derzên civakî û dîrokî bigirim’ û rêbazên mîna lihevkerîna demokratîk, siyaseta azad û hiqûqa gerdûnî tekevin meriyetê pêşniyar kiribû. Destên wî yê ji bo çareserî û aştiya navbera gel li hewa mabû û ji aliye hêzên serdest ve şerên bêsinor hatibûn pêşxistin.

Van tesbît û bangawaziyên, bi bawerîya xwe ya azadî û heqîqetê anibû ziman. Ji bo xetereyên ku wekî çarenivîsên tîna nîşandan beralî bike, îradeyeke xurt nîşan dabû ku di kesayeta Kurdan de çareseriyê di asta gerdûnî de bixe xizmeta gelên cîhanê.

Nêrîn û pêşdîtinên Birêz Ocalan, baş hatine fêmkirin ku li Tirkiyeyê pêkhatina demokrasîyê rasterast bi çareserkirina pirsgrêka Kurd ve girêdayî ye.

“Demokrasî şaş hatiye pênasekirin”

Tê zanîn ku demokrasî di destpêka avabûna Komara Tirkiyeyê de şaş hatiye pênasekirin û bi vî pênasekirina şaş, hemû reng, deng, çand û ziman hatine înkarkirin.

Sedema vî înkare jî ew e ku Komara Tirkiyeyê li ser bingeha netewdewlet û kapîtalîst a yek nasnameyî hatiye avakirin.

Mixabin ev sedsal in ku sîstema netewdewlet li erdnîgariya me, rê li bêr sûcên giran ên ku li hemberî mirovahiye pêk tên vekirîye.

“Di siyaseta jiyana azad de îsrar kirîye”

Birêz Ocalanê ku bi hişmendiya çareserkirina pirsgrêkan derketiye rê û dest bi têkoşînê kiriye, paradîgmaya çareseriyê afirandiye û di siyaseta jiyana azad de îsrar kiriye, nîşan daye ku ew aktorê bingeînê e pêşketina polîtîk û demokratîk e.

Perspektîf û pêşdîtinên birêz Ocalan a bi rêya hevîtin û muzakreyan, bi rêbazên aştiyane,

giringiyeke dîrokî ya di asta stratejîk de ye.

Ji bo ku kurdan bi ziman, nasname û erdnîgariya wan re bigihîne statûyeke neteweyî, paradîgmayeke bi perspektîfa neteweya demokratîk pêş xistiye, em îro dibînin ku ev paradîgma, bi taybet bi mînakê Rojava, ji bo Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn, ji bo tevahiya cîhanê buye hêza çareserkirina pirsgrêkan.

Ev hêza nêrînê wî yê ekolojîk û azadîparêziya jinê, hem ji bo çareserkirina pirsgrêkên civakî yê vî demê û hem jî, ji bo paşerojê ne.

Êdî ji çar aliyên dinyayê gel, rewşenbîr, nivîskar, hunermend û siyasatmedar jî dibînin ku nêrînê birêz Ocalan, li hemberî pergala kapîtalîst bûne alternatîf û hêviya çareseriyê.

Her çiqasî Birêz Ocalan li Îmraliyê hatibe tecrîtkirin û desthilatan xwestiye ku têkiliya wî jî dinyayê qut bikin jî, her dem ji bo ku krîzên heyî bi dawî bibin teoriyên çareseriyê bi pêş xistiye.

“Ocalan niha li tevahiya cîhanê aktorê herî polîtîk e”

Wan xwest ku bi rêya tecrîdê Birêz Ocalan bidin jibîrkirin lê ramanên wî gihîştine hemû gelan û tevahiya cîhanê.

Birêz Ocalan niha li tevahiya cîhanê aktorê herî polîtîk û zanayê ku dinya nêrînê wî esas digire ye.

Brêz Ocalan afrînerê jiyana hevpar û wekhev a artarnatîf e. Ji bo azadiya Birêz Ocalan û ji bo pergala wekhevî û heqîqetê ava bibe li tevahiya cîhanê têkoşînê meşandin.

Hemû kes û kesayetên ku têkoşîna azadiya birêz Ocalan dimeşînin, bi yek dengî diqîrin û dibêjin azadiya Birêz Ocalan azadiya me ye. Ev tesbît nîşan dide ku her têkoşîna were meşandin ji jiyana wan jî ne dû re.

Hemû jinên cîhanê diyar dikin ku, pêşketina têkoşîna jinên Kurd a li gorî nêrînê birêz Ocalan bandor li wan kiriye û ew ê jî tevî vî têkoşîna ramana azad û jiyana azad bibin, têkoşîna jinê geş bikin, bipêş bixin û dibêjin pergala tecrîda Îmraliyê ya ku Birêz Ocalan tê de ye, rewşeke li dijî mirovahiye ye û pêwîst e demildest ev tecrît bi dawî bibe, rêgez û rêbazên gerdûnî yê ji bo Nelson Mandela pêk hatin, jî bo Birêz Ocalan jî divê pêk werin.

“Ev 25 sal in mafên Ocalan tên bînpêkirin”

Lê tê zanîn ku ev 25 sal in hemû mafên Birêz Ocalan ên huqûqî tên bînpêkirin û bi cih nayên. Ya giringtir, ev ji 30 mehî zêdetir e tu agahî jî Birêz Ocalan nayê girtin.

Di serî de divê hevîtinê parêrez û malbatan bi Birêz Ocalan û girtiye Îmraliyê re werin kirin, agahiyên zelal ji Îmraliyê werin girtin.

Ji bo çareserîya pirsgrêkên civakî û siyasî pêwîst e şert û mercên têkoşîna siyasî û pêkhatina muzakereyan ji bo Birêz Ocalan bîna afirandin ku hevî û bendewariyên gelê Kurd û gelên cîhanê yê ji aliyê civakî û siyasî ve pêk werin.

Roj ew roj e ku Birêz Ocalan rasterast bi gelan re were cem hev da ku rola xwe ya aşitî û azadiyê pêk bîne.”

Basim Ewadi: Hikûmeta Îraqê pêşwaziya destpêşxeriya PDKyê li Kerkûkê dike

Hikûmeta Îraqê pêşwaziya destpêşxeriya PDKyê dike ku baregehê serkirdetiya xwe li bajarê Kerkûkê pêşkêşî Zanîngeha Kerkûkê kiriye.



Roja Pêncşemê, 26ê Cotmeha 2023ê, Berdevkê Hikûmeta Îraqê Basim Ewadi ragehand, Hikûmeta Îraqê pêşwaziya destpêşxeriya PDKyê dike ku baregehê xwe pêşkêşî Zanîngeha Kerkûkê kiriye.

Basim Ewadi ragehand, Serokwezîrê Îraqê Mihemed Şiya Sûdanî vî destpêşxeriya hekîmane bilind dinirxîne.

Berdevkê Hikûmeta Îraqê herwesa amaje da wê yekê jî ku Serokwezîrê Îraqê tekezê li ser cidîtiya Hikûmeta Îraqê dike ji bo seqamgîrî û ewlehî û pêkvejiyan û biratiyê li Kerkûkê û tevaya parêzgehên din ên Îraqê, ev jî bi liberçavwergirtina karnameya hikûmetê ji bo bicihanîna serweriya qanûnê.

Di civîna 26ê Cotmeha 2023ê de, ji bo parastina canê tebayî û seqamgîriya bajarê Kerkûkê, Komîteya Navendî ya PDKyê biryar da baregehê berê yê civata serkirdetiya xwe li Kerkûkê pêşkêşî Zanîngeha Kerkûkê bike û ji bo xwendekaran û piroseyên xwandinê û rewşenbîrî û pêşxistina wî bajarî bike diyarî.

Pêştir, li roja 12ê Cotmeha 2023ê, Dadgeha Bilind a Federalî ya Îraqê biryara rawestandina radestkirina baregehê operasyonên hevpar helweşand û biryar da wî baregehî ji bo PDKyê vegeriye.

Li Efrînê 3 Kurd hatin girtin: Çarenivîsa yekî ji wan ne diyar e

Li çend herêmên cuda yê Efrînê polîsên serbazî yê ser bi Tirkiyeyê ve 4 Kurd desteser kirin.

Li gorî Rewangeha Sûriyeyê ya Mafên Mirovan (SOHR), li gundê Baflorê yê navçeya Cindirêse ya Efrînê, dema welatîyekî Kurd ê 27 salî ji bajarê



Helebê vegeriya ji aliyê polîsên serbazî ve hat girtin.

SOHRê da zanîn ku wî kesî du dikan û xaniyek kirîbûn lê grûpên çekdar dest danîbû ser wan.

Piştî ku ew kes vegeriya Efrînê daxwaza mal û milkê xwe kiriye polîsên serbazî ew desteser kiriye.

Welatîyê Kurd ê 27 salî heta ku xwe ji nav lepên wan xelas kiriye 10 hezar dolar dane wan.

Çarenivîsa wî ne diyar e

Herwiha li gundê Şêxotkayê yê bi navçeya Mabatayê ya Efrînê welatîyekî Kurd ji aliyê polîsên serbazî ve hat girtin û heta niha çarenivîsa wî ne diyar e. Li taxa Mehmûdiyê ya bajarê Efrînê, welatîyekî Kurd ê ji navçeya Şerayê ya Efrînê ye ji aliyê polîsên serbazî ve hat girtin.

Ew kes jî bi tohmata “pêwendîya bi Rêveberîya Xweser re” hat girtin. Li aliyê din, 20 Çiriya Pêşînê jî li gundê Dêr Siwanê yê navçeya Şerawa ya Efrînê jî polîsên serbazî yê ser bi Tirkiyeyê ve, 5 Kurd girtibûn. Ev 5 Kurd jî bi tohmetaku “pêwendîya wan bi Rêveberîya Xweser re heye” hatibûn girtin.

Galant: Yan em ê bi ser bikevin an ew ê bi ser bikevin

Wezîrê Parastîne yê Îsraîlê Yoav Galant got ku êrîşên li ser Xezayê dê tundiya xwe kêmaneke û got ku 'Şer dê dirêj be û yan em ê bi ser bikevin an ew ê bi ser bikevin.'



Yoav Galant di daxuyaniya xwe de bal kişand ku tevî biryara 'agirbesta mirovî' ya ku di Neteweyên Yekbûyî de bi piraniya dengên hatiye girtin, ew ê tundiya êrîşên li dijî Xezayê kêmanekin.

Galant got ku "Duh şer derbasî qonaxê nû bû û Hamasê ji ya ku berê nedîtibû zêdetir lêdan. Îsraîl hemû hewilên xwe dide ku kesên dîlgirtî paşve vegerîne.

Em çiqasî tundtir li Hamasê bixin, siûda me ji bo gihîştina çareseriyekê ku dê mirovên dîlgirtî vegerîne, baştir dibe. Artêşa Îsraîlê li hemû eniyên ji bo şer amade ye."

Lavrov: Bandorên şer, dê bi dehan salan berdewam bin

Wezîrê Karên Derve yê Rusyayê Sergey Lavrov diyar kir ku bêtîrîmîna Xezayê û gelê wê yê sîvîl tune kirina Hamasê ne pêkan e û got,



"Heger Xezayê were hilweşandin, karesateke ku bi deh salan berdewam bike dê peyda bibe."

Sergey Lavrov destnîşan kir ku êrîşa li dijî Îsraîlê nayê qebûl kirin û wiha got: "Îsraîl bi awayekî ku hiqûqa navneteweyî bi temamî tev-nagere, ji raya giştî re ragihand ku dê berteka wê hovane be û dê Hamasê tune bike. Bêtîrîmîna Xezayê û gelê wê yê sîvîl wêran bike, ne pêkan e ku were tune kirin."

Lavrov destnîşan kir ku divê pevçûnên li herêmê rawestin û alîkariya mirovî ji gelê Xezayê re bê kirin û got, "Heger Xezayê wêran bibe û 2 milyon niştecîhên wê bên dersînorkirin, ev yek dê bibe karesateke ku dê bi dehan salan berdewam be."

Tirkiyeyê êrîşî Dêrikê kir: Femandarekî canê xwe ji dest da

Li gorî çavkaniyê xwecihî, di vî êrîşê de kesekî bi navê Şiblî Şiblî canê xwe ji dest da ku



femandarekî Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) e.

Di heman êrîşê de jinek û zarokê jî birîndar bûn û paşê zarokê birîndar canê xwe ji dest da.

Piştî ku Şiblî Şiblî bi malbata xwe re ji malê derketiye, Tirkiyeyê bi dronan êrîşî wan kiriye.

Tirkiyeyê beriya niha jî hewl dabû ku Şiblî Şiblî bikuje lê ew ji êrîşa Tirkiyeyê ya bi dronan sax filitibû.

Kurd di bin gefa qirkirinê de ne

Kurd û hêzên mezin ên nûnertiya Kurdan dikin, divê bizanin ku rû bi rûyê xeteriyê mezin in û bi wê zanebûnê bibin seferber. Divê her kes li gorî vî şerê mezin tev bigere. Kurd rû bi rûyê gefe qirkirinê ya rastîn in.

Li Kurdistanê şerekê mezin heye. Lê nahêlin ku dinya vî şerî bibîne. Ewropa û DYE ku piştigiriya vî şerî dikin, li mirov rûniştîye. Wek ku tu şer li herêmê nîn be tev digerin. Dewleta Tirk Başûrê Kurdistanê bi tevahî daye ber xwe ku dagir bike. Baregeh û êrîşên xwe yê ji hewayê ve zêde kirine. Çekên qedexekirî, çekên kîmyewî û nukleer ên taktîkî bi awayekê sistematîk hema bibêje her roj bi kar tîne. Bikaranîna çekên qedexekirî di çapemeniyê kêman zêde hat nîşandan. Dîmenên kesên bi van çekan hatine kuştin, hatin weşandin. Ên ev nûçe çê kir, dîtina xwe got, li Tirkiyeyê hatin bêdengkirin, girtin. Diyar e ku wê dewleta Tirk a qirker bikeve hewila veşartina sûcên xwe. Lê NY û welatên Ewropayê, saziyên ji venihêrîna çekên qedexekirî berpirs in jî bûn şîrkê vî sûcî, xwe ker kir, çavên xwe girtin.

Dewleta Tirk ku xwe li Başûr bi cih kiriye û baregehan ji xwe re ava dike û li bombebaranê dewam dike, bi destên PDK'ê pêk tî. PDK bi faşîzma Tirk re nebe piştgir, nikare bi vî awayî li şer dewam bike. PDK nahêle şande ji der ve werin û vekolînê bikin. Ji vî awayî ve Başûrê Kurdistanê ji bo dinyayê hatiye girtin. PDK êrîş û dagirkeriyê rewa dike. Nabêje ku berpirsê êrîşan mêtînger û dijminên Kurdan e, lê dibêje ku berpirs PKK û gerîla ne. Bi vî awayî dinya dengê xwe nake, karê hêzên bi dewleta Tirk re dibin piştgir, hêsan dike.

PDK û ENKS ku dûmahîka wê ye, li Rojava jî heman tiştan dikin. Erdogan û Bahçelî ku faşîst in, ji bo neyartîya Kurdan û bi armanca rakirina Rojava ji holê, koalîsyon ava kir. Erdogan, herêmên Kurdan ên ji Efrînê ta bi Dêrîkê, ragihand ku kembêra terorê ye û da zanîn ku wê van deran wek herêmên xwe yê ewle dagir bike, Kurdan bike koçber û yê

ji Sûriyeyê bûne koçber, bi cih bike.

PDK û ENKS ji bo Erdogan pak bikin, got ku sedema êrîşên bi ser

Rojhilata Navîn lihevketî ye.

Îsraîlê dibêje ku ew dev ji êrîşkirina Xezayê bernade. Xezayê xera dibe.



Rojava de YPG û PKK ne. Çimkî wan jî mîna dewleta Tirk qedandina PKK û PYD'ê daye ber xwe û di vî mijarê de bi dewleta Tirk re di nav hemû planan de ne.

Dewleta Tirk 5'ê Cotmehê hemû çavkaniyên jiyanê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji xwe re kirin armanc. Binesaziya herêmê bi rojan da ber bombeyan. Du kesên li Enqereyê çalakî li dar xist ji xwe re kir hincet ku qasî ji Sûriyeyê derbas bûne. Eger planê xerakirin û dagirkirina welatê hatibe kirin, dîtina hincetan ne tu zor e ku Erdogan bi awayekê bêperwa, bi eşkêrî dibêje ku wê korîdora Kurd anku cih û warê Kurdan belav bike. Erdogan di civîna koma partiya xwe de cardin da xuyakirin ku wê "korîdora terorê" bi êrîşên nû belav bike.

Rêveberiya Rojava şer li dijî dewleta Tirk ranegihandiye. Armanca wê ya şer bike jî nîn e. Her dibêje ku ew amade ne pirsgrêkan bi rêya diyalogê çareser bikin. Artêşa û hêzên hewayî yê Rojava nîn in. Di destên Tirkiyeyê de artêşa herî mezin a duyemîn a NATO'yê heye. A êrîşê Rojava dike û dagirker dike ew bixwe ye. Ew bixwe ye ku dide zanîn ku wê cih û warê Kurdan bike kembêra xwe ya ewlehiyê û belav bike. Anku yekalî êrîş û dijminahî tî kirin. Bi kîjan aqil û wijdanî, li ser navê Kurdan mirov dikare vî qirkerî û êrîşkariya dewleta Tirk rewa bike?

